



Destpêk

Li pêşî, em desteya rojnameya Pênûsa Nû, derketina rojnameyê li gelê xwe yê kurd, bi taybetî li helbestvan, nivîsevan û lêkolînerên ku dê rojnameyê bi nivîs û berhemên xwe dewlemend bikin, pîroz dikin.

Rojnameya Pênûsa Nû rewşenbîrî, wêjeyî û hunerî ye, her wisa Duzimanî ye, kurdî û erebî. Her du beş ji hev cuda ne, ji ber wê em ji nivîsevanên xwe bi hêvî ne berhem û nivîsên kurdî li ser maila beşê kurdî, û yên erebî li ser maila beşê erebî bişînin.

Em desteya rojnameyê ji nivîsevanên xwe bi hêvî ne ku nivîs û berhema berê belav bûbe ji me re neşînin, lê piştî di rojnameyê de belav bû ew dikarin êdî li deverin din biweşînin.

Heçê bixwaze dikare Quncikek wî ya taybet, di bin navê ku ew hilbijêre, di rojnameyê de hebe û bi berdewamî di quncika xwe de binivîse.

Rojnameya Pênûsa Nû ji weşanên Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûrî ye. Li hundurê welêt derdikeve, her wisa di rojên li pêş de dikare li derveyê welêt wê çapê bi xwe derxîne. Li destpêkê li ser pelan û jimarek hindik derdikeve, lê emê hêdî hêdî hewl bidin ku em jimarên pirtir bikin, ji xwe ewê bi riya Internet jî bi firehî belav bibe.

Rojnameya Pênûsa Nû rojnameya we ye, xwedî lê derkevin, bixwînin û bidin xwendin..

Mercên weşanê

-Rojnameya Pênûsa Nû gotar û helwestên siyasî, daxwiyaniyên partî û rêxistinên nawaşîne, di heman demê de lêkolîn û gotarên rexneyî ji bo sêdwergirtinê diweşîne.

-Gotar an berhema bê wêne, navnenas û bi naveroka ne di ast û ramana rojnameyê de be nayê weşandin.

- Em nivîs û berhemên bê naverok, her wisa wan nivîsên ku dê kesekî birîn, tawanbar û her weha kesayetiya hin mirovan birîn bikin, nawaşînin.

---Berhemên werin weşandin bi

taybetî yên rojnameyê ne, bi hêviya li cihêkî din nehatibin weşandin.

Birêvebiriya rojnameyê di balavkirin û nebelavkirina nivîsan de azad e, her wisa rojname ne tim mecbûr e sedemên nebelavkirinê diyar bike.

-Em wek desteya rojnameyê ji mafê xwe dibînin ku zimanê nivîsan serrast bikin, lê divê ku naveroka nivîsê neyê guhertin.

-Ji bo nivîsên wergerandî, divê nav, sal û cihê orjînalê nivîsê bi wergerandinê re diyar bin.

Desteya rojnameyê ne tim mecbûr e bersiva nivîsevan bide, eger hat û nivîsa wî nehat weşandin an bi dereng ket.

-Rojname tenê bi E-mailan pêşwaziya nivîs û berheman dike.

-Dê zimanekî petî ji rojnameyê re hebe, êdî desteya birêvebir azad e di serastkirina çewtiyên rêzimanî û destnivîsî de.

-Rojname ne berpirsyar e di ber dîtin, bîr û boçûna nivîs û berheman de, belê em di ber naveroka nivîs, daxuyanî û şiroveyên bi navê rojnameyê derdikevin de, berpirsyar in.

-Çê nabe di nivîsan de dijûn û gotinên kirêt ji kesayetî, rêxistin, ol, komele û partiyên re bêne nivîsandin.

-Rexnegêrî divê li gor raman û pîrensîpên rexnegêrî û nivîsevaniyê bin.

-Bicihkirina nivîsan di hundurê rojnameyê de li gor asta nivîsê û li gor mercên hunerî tê kirin.

-Emê memnûnê nivîsevanên xwe bin eger nivîsên xwe bi riya wordê wek pêvek û wêneyekî(ne di wordê de) bişînin.

-nivîs û berhemên bi kurdî li ser maila beşê kurdî: kurdi.penusanu@gmail.com , bişînin.

Dubare Pênûsa Nû li we, li me û li gelê kurd pîroz be.

hezirana 2012an

Desteya birêvebir a Pênûsa Nû.



Narîn Omer

narinomer76@gmail.com

Narînkek zelal ji xelata Mela Ehmedê Palo re

Ji hestê dil û can ez narînkek botanî û koçerî di rêsim û di rêka çand û wêje ya kurdî de di weşînim, û pêre gurzek sipasiyên şadîmaniyê ji kombena nivîskar û rewşenbîrên kurd li sûriyê re û ji malbata Seydayê nemir (Mele Ehmedê Palo) re li ser wê baweriyê mezin ya di bîroka dil û ramanê min de çandîn, û ez jî soza mezin di kakila baweriyê wan de di çikilînim kû ez li himber wê baweriyê bimînim da em hemî bi hev re xizmeta çanda xwe bikin, û alîkarbin di hemî doz û peymanên gel û miletî xwe de.

Helbet ev xelata pîroz û wate giran ne para min bi tenê ye, belê ez wê diyarî hemî nivîskar û rewşenbîrên kurd û xizmetkarên çanda me dikim, û diyarî bo gîyanê seydayê hêja dikim yê kû jiyana xwe û temenê xwe di xizmeta çanda kurdî de derbaskirye, û ji hemî kesên malbata Palo re.


Sipasî bo hemî kes û heval û mirovên bi min re alîkar û dilsoz, bi taybet malbata min, ew her sisê kulîkên baxê dilê min dixelînin, zarokên min (Dastan, Sazîn, Şêrîn), û bavê wan yê dilsoz (Ridwan Remo.)

Serkeftin û pêşveçûnê ji gelê me re dixwazim, û bi hêvî me xweşî û azadî para me bimîne di pîşerojê de.

Sipasiyên zelal bo malbenda (Apo Osman Sebrî), û hemî xwîşk û birayên amadekar û tilivizyonên kurdî û malperên kurdî û malbend û nivîsgehên bi rûmet re.

Gurzek awaz û sitranên semadar bo hunermendê hêja

(Seid Ferso) re bo amadebîna wî ya bedew.



Dilşad Mella



Jin û Şoreş

Yê ku şoreşa Sûriyê a ku ji salekê ve li dijî zilm û zordariyê despêkiriye bişopîne, wê bibîne ku tev zarokên gelê Sûriyê têde beşdarin, biçûk û mezin, jin û mêr bê cudabûn.. wiha jî rêjîmê cudahî nekiriye navbera zilam û jin, ne zarok û kalemêran.. Ew rêjîm amade ye tevan bikuje da ku ew bi tena xwe bimîne...


Cîhanê tevî jina Sûriyê a leheng; jin be an keç be an bi mêr û bê mêr be, dît bê çawa li kêleka zilamê Sûriyê sekiniye û pêre beşdariyê di vê şoreşê de dike û hejmara jinan têde mezin e. Nexasim ku di gelek bajarên Sûriyê de jin bûye armanca kujeran..Di gel ku hatiye revandin, namûsa wê berebatkirin û bi bedena wê hatiye listin..

Eger jina Sûriyê beşdarî di şoreşa Sûriyê de kiribe, ew bi rola xwe a normal û aktîv di jiyana de rabûye û ev ji mafê wê ye. Nexasim zilm û zora ku lê dibe û bûye dubare ye; ji rexekî ve kurê wê, mêrê wê, birayê wê û bavê wê armancên rêjîmê ne, digel ku ew bixwe jî armanc e.. Û wiha jina Sûriyê nedûrî zindanê bû, ne dûrî zindanê ye û gelek jinên têkoşer di Sûriyê de hene ku ketine zindanan de û hên jî jinên têkoşer di zindanan de hene.

Jinên Sûriyê di tev warên jiyana rojane de li kêleka mêrê xwe û malbata xwe sekiniye û gelek jinên têkoşer yên naskirî di Sûriyê de serê xwe di gelek waran de bilind kirine, nexasim di warê siyaseta û pêşesaziya de.. Jina Sûriyê ji wan jinên ku şoreş bi hêza wan hatiye vexistin û hinan ji wan plana şoreşê daniye wek jinên bajarê Der,ayê yên ku bi sedema axaftina telefonê li ser rêjîmê hatin girtin û zindankirin. Tevî vê yekê, ew jin bi pêşeroja Sûriyê ya azad û demokrat geşbînin.

Serkefetina şoreşa Sûriyê - ya ku wê nêzîk pêk were- wê Sûriyêke nû, Sûriyêke wek hev be, Sûriyêke bê cudabûn be di nav nijadên ku têde dijîn.. Her wiha wê rola jinê jî têde ne tenê dîkorî be, belê wê jin rola xwe di tev warên fermî de bilîze û wê xwedîdan be, wek ku çawa di jiyana rojane de xwedîdane.. û wê ev jin piştgireke mezin be ji demokratî, dademendî û wekhevîyê re, ji ber ku ew bêtir di welatê wê de, ji ber karbidestan ve, bi êş û janên ku dîtîye serweste.

Mehfûzê mele silêman



Rewşenbîr kiye??

* Rewşenbîr Mûma (finda) ku bi xwe dibişive, û bi tîşkên xwe perdê tariyê di çirîne, û bi tîrêjên xwe dîwarê reşiyê diruxîne.

* Ronakbîr Şivanê zîrek û hişyare, yê ku keriyê xwe bi guhdan rêz û kom dike, û bê ziyana di çêrîne, û bi rehetî û hesanî ber bi mal ve vedigerîne.

* Rewşenbîr Ewrê giran û bê denge, ku di dem û cihê tê xwestin de barê xwe valadike û di barîne, û jîndar , zevî û deviyana pê avdide.

* Ronakbîr Şûrê tûje, yê ku xwediyê xwe diparêze û bendên sitem û zorê dişkîne

* Rewşenbîr Rêber û efserê bê tirs û reve , û tim li pêşe, bi dilsozî û şarezayî leşkerê xwe serfiraz û serkeftî dike.

* Ronakbîr Hoşê (simbilê) dagirtî lib û bere, bi şanazî û bi rûmet serê xwe berjêr dike

* Rewşenbîr çekê cengawere , ku dema gerek û pêwîst be, bi kêr tê û pêk tê bê zirt û fort.

* Ronakbîr Asîmanê bê sînore, bi saz, rêk û pêk, û bê rawestan dizîze û diçerixe

* Rewşenbîr Hostayê bi endaz û pîvan e, dîwarê xwe bibinyad û tekûz ava dike, da ku nekeve û nehêrive .

* Ronakbîr Felemezê dûrbîne bi raman û nerîne, ne bizdoneke , ne keysbaze, xwedî helweste , ne du riwe, ne dudiliye û ne tiroviro ye...

* Rewşenbîr ne bi berg, nav û nîşana ye, belê bi reng, navrok û raman e .

* Ronakbîrî ne bi ezîtiyê ye , belam bi terziyê ye, ne bi xwepêşandana arzane, belam bi bédengiya girane, ne bi gelc û halana ye, belam bi nexş, rêz û pîlana ye.

* Rewşenbîr balyozê welatê xwe ye, rewşa gelê xwe ye, deng û rengê warê xwe ye, nimûneyê qencîrîn hevvelatîyê xwe ye.

* Ronakbîr bextê sipiye, rûmeta gewr e, hişê paqije, hestê raste, peyva diruste, derûna çake, rewanê pake, xwîna çalake, di laşê mirovatîyê de, û di gewdê netewatîyê de .

Arşek Baravî

arshekbaravi@gmail.com



Xewn..

Hezkerên min.. hey ên ku bi min re giriyan, an bi pênûsa min re..di gotara hingavtî de kovanin, an jî ji we werê ku ez di êş û azar û kovaniyan de.. û roja dirêj tevî bi nalandin dijîm, ha vaye ez bi hengûrê re rojê li pê xwe dihêlim(xatir ji rojê dixwazim) û bêxewiya gotaran ji boy we dinivîsim, ha vaye ez.. ji xewna xweyî berdeyam.. hişyarî û jîrbûnê ji xwe didim gumandarê ku dixwaze rojên minî sayî .. şelû bike, an zîrekiya min bikuje.., ez di dilê xwe de mîna spîbûna berfême.. boy ên ku bi gûmanin ku erê ez di şevê meha çille(rêbandan-behmen) de jandarê qirr û qeşê û sermême, ev xewna hişyariya mine .. di her saleke ne zindîgorkirî de.. ez xwe bi we re bi naskirin didim.

Piştêrast û dilniya bin.. ku min xewna jîneke germ û ne li bîra xwe dît, min mîna çivîkekî.. per û baskên xwe li ser banên Amûdê dadiweşand.. û li laleşê min xwe da ber siyê.. û li deşta Amedê min li bejna Spîndar û Çinarê temaşe kir û min Guhîj û Qizwan û Hilotirşkên çiyayê Omeran.. û Maziyên Dêrika çiyayê Mazî di bîra xwe anîn, min ji Ferat û Diclê têr vexwaribû.. lewra min çû di gola Wanê de jî avjenî(sobelanî) kir.., di ser Zozanê Şerefîdîne re firiyam û tahtok û hîmdeyên çiyayê Agirî ji xwîna komkujiya lehengan ... hîn jî sor bûn, kej û demsal ji befra Qarsê re yeker bûn, min buhara Mihabadê û Şahrezûrê xweş didît, lê ez rêwiyê rêya dîr bûm .. bêyî rawestan,ji sêkuça sê sînoran .. Zap jî kesera min bû, Helepçe û Xormal tev gund û bajarên kevna.., xewnê gefa hişyrbûnê li min dixwar, Cûdî ji min ne dîr bû ..ne Dihok û ne Şingal, Hewlêra xemgîn û Efrîna rengîn, Kûban û Dêrik û Qamişlo jî hîn, Sorsin.. Binefs.. Gangilok ..û..û..û.. tev de xemla welatê min bûn...

Kurd tev birane ev cîh û warê wane, di xewna min de ronahiyê bajarên min mîna zêr.. diçirisanin, di xewna xwe de min Gwîz û Hinar û Petrîşok.. û şîrê pêsîrên dayika xwe pev re dixwarin, welat ne ev tenêye.., xewn her tiştî nabêje, eveya xewna min bû.., xewna hişyariyê bû, bêyî kovanî bû.. û bêyî girî bû, bêyî hêsir û lehiya çemekî bû, belê ew.. dîlana gewndakê bû, ji çêkirina sazvanekî bû, di asîmanê welêt de sînor û dergevan tune bûn, olgehên hemû ol û ayin û zagonan bi min şa bûn, lê di dilê min de ..şadî serkan ma, kanî kovanî hevalnoooo???

Gelo we hêsirên min dîtin.. çiku ew ji çilapekên baranê bûn, baraneke bi ferr û bêr li deşteke tî bû???

Ez dil nakim û ne dixwazim.. ku ez civanana bidme we, ez naxwazim bi dîdara we şa bibim, ez ne fitekî an qedekî abûrîme..da ez kurrê bavan ji rê bibim(bixapînim), dilê min ne bi kule mîna gotinên we.., bi piştêrastî û ewleyî ez li virim, ez li vir.. di navbera dost û hogirên xwe deme.. ewên ku dizanin rêzdariyê bidine mirovan.. û ew boy min zor girîngin .



Helîm Yûsiv

DORBÎN

Ala kurdî û partiyên kurdan



Qonaxên dîrokî, mîna vê qonaxa niha ku Sûriyê bi ereb, kurd û hemû neteweyên xwe, tere derbas dibe, pirsên mezin yê hebûn û nebûnê bi xwe re tînin. Di van çend meh û salên pêşiya me de, Kurd li hember ezmûneyeke girêdayî hebûn an nebûna xwe ya di hundir vî welatî de ne. Ji nav gelemşeyên ku derketin, ji bilî perçebûna civaka kurd di navbera hêzên siyasî de, ku heta niha belawela ne, pirs xalên hevbeş jî li ser du astan hate holê. Yek jê, li ser asta seranserê welêt ku welatê bi navê Sûriyê tê naskirin cihê hevbeş yê hemû neteweyane. Ya din jî, li ser asta kurdî ku ji bilî ziman, xala gengeşiya li ser ala kurdî û hevbeşî û nehevbeşiya wê di nav kurdan de, tevliheviyêke mezin bi xwe re anî ye. Di vê çarçovê de, gelek ji hevalbendên partiya karkerên kurdistanê, ku bi giştî li derûdora Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD civiyane, bi behaneyê ku ev ala kurdî ala başûrê kurdistanê ye, yan jî ala Partiya Demokratek Kurdîstana iraqê PDK ye, ew al hilnegirtin û aleke din ku ji sê rengan zer, sor û kesk pêk tê, hilgirtin.

Gelo ev al, bi rastî ala partiyekê ye, yan ala perçeyekî kurdistanê ye, yan jî ala hemû kurdane?

Bi dorbîna xwe ya vê carê, em ê li bersiva vê pirsê bigerin.

Ev al ji ku hatiye?

Li gor agahiyên ku di hin jêderên dîrokî de tene dîtî, ev al cara yekem di sala 1919 an de, ji hêla "Teşkilatî İctîmaîye camiyatî" yê ve, hatiye sazîkirin. Anku ji hêla komela civakî ya Kurd ve, ku di destpêka sedsala bîstan de, li Stembolê, li ser destên siyasîmedarên Kurdên ku piraniya wan ji bakur bûn, hatibû avakirin.

Rengên Alê: Sor li jor. Kesk li jêr. Spî û rokeke zer li ortê.

Ev al weku aleke neteweya kurd hate pêşkêşîkirin. Di kovara Hawarê de, xwediyê wê Mîr Celadet Alî Bedîrxan û nîfşê wî, ji birêveberên tevgera siyasî û rewşenbîrî li bakur û rojavayê Kurdîstanê, xwedî li vê alê derketin û ew weku ala mîletê kurd pejirandin. Celadet bi van gotinan behsa ala kurdî dîke "Her mîlet xweyîyê alekê ye. Al nîşana mîlet û welat e. Tevayîya heyîna mîletan di ala wan de civiyaye. Al namûs, rûmet û bextê mîletan e. Zarowên her mîletî ji bona bilindî û biqedîrbûna ala xwe, xwe didin kuştin. Ala her mîletî jê re beha ye..... Ala kurdan, ji jor ber bi jêr ve, ser hev, sor, sipî û kesk e, di nava wê de roj diçirise." (Hawar-30.9.1932)

Ji bilî ku gelek nivîs û helbest, di Hawarê de, li ser vê alê hene, wisa jî bergê hejmara yazdehan ya kovarê bi vê ala kurdî, weku semboleke neteweyî, hate xemilandin.

Wateyên rengên alê

Li ser wateyên rengên alê şîroveyên cihê hene, ji wan:

Sor, rengê şoreşê û xwîna şehîdane.

Kesk, rengê siruşt û xweza ya Kurdîstanê û xweşiya wê ye.

Sipî, rengê aşîtxwazî û aramiyê ye. Rengê pakbûna kurdan û dilsoziya wane.

Zer, Roka zêrîn, rengê ronahî, azadiyê û rojê ye. Semboleke çandî û olî ya kurdane.

Al û desthilatdariyên kurdan

Di dîroka kurdan ya van sed salên dawiyê de, gelek şoreş û tevger û serhildan çêbûn, lê di encamê de, bi awayekî fermî, heta niha du caran Kurd bûne xwedî desthilatdariyêke fermî. Yekem car li Mehabadê û bi damezrandina komara Kurdîstanê re bû-1946. Duyem car jî desthilatdariya federal ya hikumeta Kurdîstana iraqê ye- ji 1991 û bi vir de. Balkêşe ku alên şoreş û partiyên serkêşên şoreşên kurdan her dem cuda bûn, weku mînak ala şoreşa Agirî. Lê Ala her du desthilatdariyên fermî yê kurdan, tev her yek li perçeyêke cuda, Rojhilat an Îran û Başûr an Iraq, bû, dîsa jî heman al bû, ew ala ku li perçeyê dîtir, Bakur-Turkiyê, hatibû sazîkirin. Lê, dîsa jî her desthilatdariyekê li gor xwe xwestiyê ku bandora xwe li ser bikaranîna wê alê bike û wê di bin mohra xwe de bihêle. Em ê, bi kurtayî be jî, vê yekê rave bikin.

Al û komara Kurdîstan ya Mehabadê (Rojhilat)

Dema mirov li ala komara Kurdîstanê ya li Mehabadê

dinere, diyare ku komarê heman al ji bo xwe pejirandiye, lê di heman demê de, çend sembolên biçûk li roka zêrîn ya ku di nav rengê sipî de cih digre, lê hatine zêdekirin.

Zinar Silopî (Qedî Cemîl Paşa), di bîranînên xwe de, van gotinan li ser vê mijarê dinivîsîne:

Hikumeta komara Mehabadê biryar stend ku ala komarê heman al be, ew ala ku ji hêla komela civakî ya kurd ve, weku ala Kurdîstanê hatibû naskirin. Ev komele di sala" 1919ê li Stembolê hatibû damezrandin. Al jî heman ala Kurdîstanê bû, lê li aliyekî rengê sipî li dora roka zer wêneyên du sinbilan hatibûn

zêdekirin û aliyê din jî wêneyê çiyayekî û dara"sinoberê"û li dora wê bi awayekî girover (Dewleta komara Kurdîstanê) hatibû nivîsandin."

r.232-233 ji çapa erebî-weşanên kombenda Kawa 1987.

Di hinek jêderan de, li şûna wêneyê darê, wêneyê pênûsê tê gotin.

Al û hikumeta Kurdîstana iraqê (Başûr)

Ev al ji sala 2002 an de, ji aliyê parlemana herêma Kurdîstana iraqê ve, weku ala fermî ya herêma Kurdîstana iraqê hate pejirandin.

Lê ji ber ku desthilatdarî ya her du partiyên sereke PDK û YNK ê ye, al jî ji bandora nakokiyên di navbera her du partiyên de nefilitî.

"Hejmara Tîrêjên Alê li gel PDK 21 tîrêjin, lê li gel YNK 17 Tîrêjin."

Bi vî awayî, li şûna ku her du partî li xalên neteweyî yê hevbeş bigerin û wan xurt û pir bikin, hewil dan ku vê sembola neteweyî, ya ku berê heye, ji hev cuda bikin û li gor taybetiyên partiya xwe, wê biguherin.

Al û tevgera siyasî ya biserkêşiya PKK (Bakur)

Ji destpêka tevgera PKK de û heta niha gelek al hatin bikaranîn. Ji alên sor ku di bin bandora çepgiriyê de hatin hildan û heta niha ku hem PKK û hem rêxistinên girêdayî wê, alên bi rengên kesk û sor û zer ku weku rengên kurdî tene pejirandin, hildidin, lê bi ti awayî ev ala kurdî ya mijara wê nivîsa me, hilnedane. Tev ku carcaran bi destên hin hevalbedan tê hildan, lê herdem ji wê alê bi mesafet bûn, nexasim piştî ku weku ala fermî ya herêma Kurdîstana iraqê hate pejirandin. Wisa jî baweriyêke şaş hate belavkirin ku ev al ne ala herêma kurdîstana iraqê bi tenê ye, belê weku ala PDK hat binavkirin. Vê baweriyê şaş siya xwe avêt ser giringiya wê alê ya neteweyî û ew ji semboleke neteweyî ya hevbeş daxist û kir alaveke nakokiyên di nav partî û rêxistinan de.

Ev bixwe paradokseke mezin û balkêşe. Ala ku li bakur çêbûye û ji kurdên bakur weku aleke neteweyî hate pejirandin, îro ro jî hêla kurdên bakur bi xwe ve nayê pejirandin û wê alê, weku ala başûr û ya rêxistineke başûrî dibînin û di heman demê de rengên wê alê weku rengên kurdî tene pejirandin!

Jiholêrakirina wê paradoksê jî çî qasî mezin xuya bike, ew qasî jî biçûkîke û girêdayî biryareke siyasî ji birêveberiya PKK ye, ku ala kurdî weku ala hemû kurdan bê pejirandin û ala her partî û rêxistinekê bimîne jêre.

Al û tevgera siyasî ya kurdên Sûriyê (Rojava)

Siya van nakokiyên ku me li jor behsa wan kir, xwe avête ser tevgera siyasî ya kurdên Sûriyê jî. Bi taybetî di meş û çalakiyên ku di çarçoveya şoreşa Sûriyê de tene lidarxistin. Ji bilî ala kurdî ku partiyên kurd hemû weku aleke neteweyî dipejirînin, PYD bi aleke din ku ew jî rengên kurdîne kesk û sor û zer e, derdikeve kolanan. Ez bawer dikim, ev dubendî ya li hember alê xwe dispêre helwesta PKK li Bakur, ku weku me diyar kir, xwe dispêre baweriyêke şaş, ya ku wê alê weku ala aliyekî an rêxistinekê dibîne.

Encam

Mîletê Kurd, mîletekî wisa lê hatiye ku, hem di nav sînora dewletan de û hem jî di nav zarava û ziman û alfebeyên cuda de, perçewerçe bûye. Ne ziman yeke, ne erd yeke û ne jî dîrok yeke. Tenê du xalên hevbeş hene ku kurdan li her derê, weku netewe, dikin yek. Yek jê Newroz e, ku weku cejneke neteweyî tê pejirandin û ya duyem, ala kurdî ye, ku dikare ji bo hemû kurdan bibe ala neteweyî. Wekî ku pîrbûna xalên hevbeş di nav endamên neteweyekê de wan ji hev nêzîk dîke, wisa jî kêmbûna xalên hevbeş wan ji hev dûr dixîne

Cîhan Roj

cihanacirokan@hotmail.com



HEFT GUL

Problemeke min heye.- heger hûn jî wekî min rojhilatî ne, peyva 'problem' ê bibe sedem ji niha de têkiliyeke sar di navbera we û çîrokê de xwe bide der! Sînga xwe fireh bikin, ev problemeke min a şexsî ye –

Derbirîneke biwêjî dev ji pêşira min ber nade; a ku dev kiriye canê min, derbirîn e an ev ziman e? Belkî ne derbirîn ne jî ziman e; ê ku dev kiriye canê xwe, ez bixwe me!

Zimanê me dişibe peykerekî, peykerekî ku serî hatibe şkestin. Hûn ji nişka ve çav li serê peykerî bikevin ê çî hest xwe li we bide der? Hela, hûn bi destê xwe serî bidin ser gewdeyê peykêr!

Zimanê min jî bi min her wisa ye; ku biwêjek, derbirîneke nû dibihîzim halê gewdeyê peykerê bê serî bi bîra min tê.

“Tu, gelek ciwan î; te, ji heft gul, hê serê gulekê neqetandi ye.” Min ev gotin wextê ji devê diya xwe bihîst, di cî de sar bûm, min bi nihêrînên kûr li diya xwe nihêrî!

Diya min, bi wê biwêjê, temenê mirov dikir heft beş. Her beşek jî wekî gulekê dihat dîtin!

Ji kod û wateyên folklorîk madetir, wekî metaforekê, derbirînê dev ji min berneda; bi şev û rojan ew derbirîn ma li ser dilê min; ê bibûya mijara romanekê, na, min ê çîroka wê derbirînê lê bikira, na, ê derbirîn biba destpêka helbestekê... Nivîsareke sosyolojîk a ceribî, belkî meselê hel bikira...

Ji vana yek jî jê pêknehat; min ew derbirîn li berga paş a romeneke xwe kir. Piştî lêkirinê bêhna min hinekî hat ber min. Bar li min sivik bû; nivîskariya me kurdan hinekî wisa ye, heger ku em tiştekî bi aîdî ziman bibihîzin an bi dest bixin, em wê bikarneynin li me dibe bar.

Biwêjek, carna peyvek bo me muhîm e (peyva 'muhîm' sivik ma) ; wekî kod û şifreyek em lê dinihêrin. Hêvî û mereq xwe li me dide der; gelo ê ji wê tişta nû hatî bihîstin çî derê?

Di sedsala bîst û yekê de hûn halê me dibînin? Em bi çî dicoşin! Însan heyirî dimînin bê çawa nivîskarên kurd, bi zimanê ku perwerde pê nayê kirin edebîyatê dikin, heta hinekî kes vê rewşê wekî mûcîze bi nav dikin!

Ji halê ziman ketibe, wateya derbirînê muhteşem e; muhteşemiya ku nabe pariya me kurdan! Jiyane weke gul û heft beş bi kod kirine!

Gelo ew derbirîn çî wext di jiyana kurdan de bi cî bûye ku her dewrê wekî gulekê bi nav kirine? Bi îhtimaleke mezin wextê ji jiyane kêfxweşbûne, jiyane wekî gul û heft beş bi kod kirine.

Hingî berfamê xwe bûme di nav kurdan de peyva gul û rengên zindî cî didin xwe lê ji dewrên eşqê ketibe min hê nedî ye ku kurdek, temenê xwe, weke gulekê, binavkiriye. 'Gula wan, her şkestî bû!'

Qado Şêrîn

Kenê miriyan



Ez vekirî û eşkere dibêjim, ez ji ber vê biryara xwe jî şerm nakim, min bi dehên caran gotiye; ez nayê, ez nema tîm şîna miriyan, ez nema dikarim ji wilo bêtir xwe bihetikînim, ez bûme pêkenok û ketime her devî. Dîsa jî li ku yek bimre yekser telefona min tê kirin daku bi wan re biçim şîna yî mirî. Ji bo ku neçim her carê mehneyekê derdixim, hin caran xwe li mirnê datînim û xwe dixim nav livînan, hin caran hevîna xwe li ser rojan û li ber deriyê nexweşxanê datînim, her carê tiştekî diafirînim, wek li mal bim jî dibêjim; ez hezarên kîlometran dûrî malê me, êdî sê rojan divê bersiva telefona malê nedim. Her carê mehneyekê derdixim lê diyare hemû fen û fûtên min vala diçin û dost bi fen û fûtên min agahdar bûne û zextê li min dikin daku bi wan re biçim û reva min ji ber wan tune.

Ez hunerên ku di şîna miriyan de hatine serê min tînim bîra wan, ez mecûr dimînim her carê bînim bîra wan; ma nayê bîra we bê çî di şîna bavê Hesen de hat serê min, sêzde sal derbas bûn û hîna jî nav min û malbata wî xweş nebûye û xweş nabe jî eger wisa berdewam bike.

Berê ez ne wisa bûm, berê ku diçûm şîna miriyan, min jî madê xwe tirş û tahl dikir, ma ku min wisa nekirba min ê çawa diyar bikra ku kes wek min li berê mirî nakeve. Carekê li ser gora Simko yê hevalê xwe ji dê û xuşkên wî bêtir digiriyam, min li xwe dixist, min xwîn ji xwe anî, qêrîna min di asmanê heftan re derdiket, taku dê û bavê wî li ber min geriyan, ez bi germayî hemêz kirim û bi xwe re birim mal.

Ana îca li ser miriyan dikenim, kî dibe bila bibe hema ku diçim şîna miriyan dibe tîq-tîqa kenê min û ken siya xwe digre ser min û min bernada, min dagîr dike, taku li wir bim dikenim, dev lêvên xwe dikim nakim vala ye, miriyên xwe tînim bîra xwe vala ye, Helbçe û komkujiya Dêrsimê tînim bîra xwe valaye, her û her dikenim. Gelek caran xwediyên mirî bera min dane, gelek caran bixeyd û girî vedigerim malê, hema ku ji şîniyê derdiketim her tişt vedigere wek berê.

Berî du salan min sûndek giran xwar, belkî bi axa welêt bû, min soza mîrên berê da û dest danî ser simbêlan ku nema biçim şîna miriyan. Kî dimre bila bimre lê ez naçim, kî dixeyide jî bila bixeyide baştire ez bihetikim. Eger mirovên min mirin bila ew jî neyên serdana min, yek bi yekê, serbiser.

Gelekî kêfxweş dibim dema mirovek dimre û dibe nûçe û bi nûçeyê re xwediyên ê mirî E-mail û telefona xwe ji bo pêşkêşkirina sersaxiyan diweşînin, yekser radibim nameyek tije hestên xemgîn û germ dinivîsim û rê dikim, bi nivîsandina nameyê re jî dikenim, lê wisa baştire, kes min nabîne û li pêş sed mîrî min nahetikînin û min ji mala xwe naqewitînin.

Du caram dostekî min ji dêvla min ve telefona malbata miriyan kir, carekê naskirin ku ne ez im, di wê carê de hevalê min ê ku dengê min û wî qaşo wek heve du sixêf û tîfek xwar, dengê wî dihat min jî, digot; eger tu ne wek wî ba te ji ber wî ve telefon venedikir.

Cara dawî ku diçim şîna miriyan di hefteya borî debû. Diya dostekî mirîbû (xwedê wê bi dilovaniya xwe şa bike), diya wî hîna ciwan bû û ez hatim agahdarkirin ku gelekî li ber diya xwe dikeve, bîst û çar saetan digrî û li xwe dixê, îca nas û xerîb diçin serdana wî taku li ber dilê wî bigrin, min jî dixwest wek her kesî biçim, lê min nikarîbû. Dostekî bi xemgînî telefon vekir, kela girî di qirkê de, got: diya Aras miriye divê tu zû bê da em biçin ba wî, kenekî ez girtim û bernedam taku hêsrên di çavên min re avêtin, min telefona wî vekirî danî û nema rakir. Piştî kêlîkê yekî din telefon vekir û gazin kirin; yaho kes nema te li şîna miriyan dibîne, her kes pîrsa te dike, diya Aras miriye, rê jê venagere, gerek tu bê em bi hev re biçin. Hîna ez li ser telefona malê bûm bû girgira ya bêrîkan, mijar dîsa mirna diya Aras bû. Min derew kirin nekirin neketin serên wan, reva min nema.

Dema em ketin hindurê malê hîna Aras digiriyay, bi rastî dilê min gelekî pê şewitî û kela girî ket qirka min, cara pêşî bû ku wisa bi min re çê dibe, her yekî ji me bi şeweyê xwe li ber dilê wî dida, min tenê du gotin jêre gotin; bê mirin nabe, mirin tune ba meyê hev bixwara, mirin jiyana veşartîye. Min zanîbû Aras di nava xwe de bersiva min dabû; ma gerek bû diya min ana bimra!.

Ji we venaşerim, xemgîniya min gelekî berdewam û dirêj nekir, min li kê dinerî kenê min dihat, ji bo ku kenê xwe bifetisînim min li Aras dinerî, wî baş alîkariya min dikir taku qerpînî ji ber derî hat, qerpîniya burxeyan li ser keviran. Mêrek derbas bû te fedî dikir lê binêre, bi taxim û girafêt, bi simbêl û berçavk, dema ket hindur û Aras hembêz kir çavên min çûn ser sola wî, sola fotbolê ya bi burxe di lingan debû, hîna wî Aras bernedabû pirqînî bi min ket, kenekî ne normal ez girtim û bernedam, û her çavên min li ser sola wî bûn, min di nava xwe de digot; yaho wele û bile hin kes meymûn in û şerm nakin, ma mirov bi sola fûtbolê ya bi burxe diçe şîna miriyan, wele kî be û li ku be dê bi wan bikene. Her ku çavên min bi sola wî diketin dengê kenê min jî bilindtir dibû, taku du mirov rabûn ser pêyan û ji min re gotin: bi rastî tu şerm nakî, eger tu nerawestî rabe derkeve, yekî din bi çeplên min girt û ez avêtim derve. Dîsa bi madekî tirş û tahl û bi dilekî xemgîn vegeiriyam malê, û her min ji xwe re digot; tobe ku careke din biçim şîna miriyan..tobe .



Reh werîsên tozgirtî bi ser mermerê dikeve
Qantir û teht borîn dikin ...av tune ye,
Hemû tînin, niha ev bi salan e.
hemû, tevî mereziya wan devkirina ezman dicûn.
çavên wan sorin ji bê xew mayînê
birînek kûr di neqeba birhên wan de
weke dara kajê di neqeba du çiyên de, di kêlîka
rojvahiyê de.

Destên wan zeft kirî bi tivingê
Tiving berdewamiya destên wan e
Destên wan berdewaniya giyanê wan e
li ser lêvên wan hêrsbûn
û di çavên wan de merez heyê
weke stêrkek di koncaleke xwê de.

Gava dest digvêşin, rok bo mirovan bê guman e
gava bi lêv ken dibin, tayrokek biçûk ji rihên wan
yên hovane difire

Gava radikevin, duwazdeh stêrk ji bêrîkên wan
yên vala dikevin

Gava tîn kuştin, jiyên ber bi jor ve, bi alan û
dahol, dice .

Weqas sal, hemû birçî dibin, hemû tî dibin ,
hemû cangorî dibin, bi derya û zemînê dorpêç
kirî .

Germahî baxên wan xwar û şorahiyê xaniyên wan
avdan dikir ,

Ba, dergehên wan û hinek gul qedîfeyên wan yê
li meydênê rûxand .

ji qulên paltoyên wan mirin tê û diçe ,
Û zimanê wan mîna bejna dara kajê tûj e ,

Segên wan mirin di sîbera wan de pêçkirî
Û baran li hestiyê wan dixîne .

Di sengerê bekçiyê de li jor kevirbûyî ne,
cigareyên rêx dikişînin .

Û şev çavdêriya deryaya hêrs kirî dike ,
xêz tîrêja heyvê di ava deryayê de dişkîne

Ne nan û ne jî ceblexane man e
niha topên xwe bi dilên xwe dadigirin .

Weqas sal ji deryayê û zemînê hatine dorpêç kirin
Hemû birçî man, hemû kuştî ji westabûnê, lê tu
kes nemir .

Li jor ji sengerê bekçiyê Çavên wan dibirçînin, bi
alekî mezin û agirekî sor dadayî ,

Û di her berbangê de, bi hezaran kevok ji destên
wan bi aliyê herçar dergehên asoyê ve, difirin .

Ji helbestên. 1930-1960

, , *Sonata ronahiya heyvê , ,

Êvareke buharê – odak mezin di maleke Kevin û
mezin de, pîrejinek xeftanê reş lê, bi ciwanekî re
diaxive. Çira pênestin û ji herdu pêncereyan pir bi
tûjahî ronahiya heyvê derbas dibe . Min jibîr kir ku
bêjim, ev pîrejina bi cilê rêş sê pirtûkên helbest
xwedî balkêşî weşandiye bi naverokek Olî.

Nexwe pîre jin bi xortekî re diaxive .

Bihêle bi te re bêm!.....

Ma çî heyevek spehî heyê vê êvarê ! ew ê sipîbûna
porê min xuyanî neke. Ew ê heyv... disa porê min
zêrîn bike, tu nikare têdbighîjî .

Bihêle bi te re bêm !

Gava heyv heyê sîber di xanî de mezin dibin,
destên nepenî perdan dikşî in, tiliyek sawgir ser
toza pîyano peyvên jibîrkirî dinivîsîne:Naxwazim
te guhdarbim, hussss ! bê deng be !

.....

Bihêle ez bi te re bêm! ...

zanim her kes bi tenê ye, di rêwîtiya dildarî, mirin
û serkeftinê de..... veyla zanim!

min hewl da xwe, lê bê sûde.

Bihêle ez bi te re bêm!

, , *Odak biçûk di *mêzon ek sor de, ,

I

Girek ji leymûnan

Ser masê

Ser rûniştokan

Ser text

Tîrejên şewqa zer

Ber bi laşê te ve bazdidin

Êvarê kefxweşim baran bi hazar leymûnan dibar e

Û ji nişka ve zoom a nobetdarê daristanê

Kevroşkan ser nigên paş disekînine.

80 .11 .18Diyakofto

II

Hey laşê bê guneh

Çend û çend şaşîfî

Bi derbas bûna heyvekê biçûk

Li ser darên tazî yê peyarê(resîf(

Leşkerên di pîknîka xwe de

Di bin dirabiyê de, cixaran dikşênin

Roj tevî baran dibar e

Herîkîna avê ku dom dike ji karîzên rê guhdarim

Tevlî ku zanim bi vê billetê

Êdî derenge.

Atîna 18. 11. 80

*mêzon fr : mal

*Laşê tazî

Got: ez şîn hildibijêrim.!

Ez sor.!

Û ez jî.!

Laşê te spehî ye

Laşê te mezin e

Di wê mezinê de wînda bûm.

Firehiya şevê

Firehiya laş

Firehiya giyanê.

Weqas tu dûr dikevî

Ez nêzîk te dibim

Stêrkek xaniyê min şewitand

Şev li min teng dibin

Bi nebûna te li vir

Bi te hilm dikşînim.

Zimanê min di devê te de

Zimanê te di devê min de

Daristaneke tarî.

Dervan û çûk wenda bûn

Tu li kû bî

Ez Li wira dijîm

Lêvên min dora guhên te digerin

Weqas biçûk û nazik

Çawa hemû mûzîk têde dire?

Şadî

piştî ji dayikbûnê

piştî mirinê

Talî û bê dawiya nohokê.

Dest didimTiliyên nigên te

çi cîhanek nayê hejmartin.!

di hin şevan de,

çawa cîhan tev tê afirandin û rûxandin.?

Ziman ji tiliyan wirtir dialêse, pevgihayî dibe

Niha

bi henasên te re

gav û lédana dilê min tê pîvan kirin

Du meh laşên me bihev neketibûn

Sedsalek

û neh xole.

ez ê çî bi stêrkan bikim

ger tu ne li vir bî?

ez bi sorbûna xwînê re me ...ez yê te me.

Atîna 24. 9. 80

.....
*sonata:peyveke latînî ye bi wateya, , guhdarbûn,
, , weke alavekî di mûzîka kalasîk de tê
xebtandin .

• *Xwenêrê rêzdar!. Min çend perçe ji
helbestên rengereng yê Y. Rîtsos wergerand ji
zimanê wî bo kurdî, bê alîkariya zimanekî din
navberê .

Salih Bozan

KIZÎRO



Li şerqî Kobaniyê, li gundekî nav çiyayê de, mirovek hebû navê xwe Kizîro bû. Mala xwe li paş gund bû, di du xaniyên ji axê de dijî. Rojekê berve roava dengê qîrîna jina wî bi girî hat. Şênîyê gund giş çûn wir, û hema ji dûr ve jê pirsîn: Lê Îslimê (Navê jina Kizîro) te xêre? şalam tişteki mezin nehatiye serê te? Îslimê zêdetir kire hawar, û di nav giriyê xwe re got: Kizîro mir.

Şênîyê gund xemgîn bûn, herkesî di ber xwe de kire piste pist: Rehma Xwedê lê be. Jinên gund jî hatin bi Îslimê re giriyay.

Kalên gund gotin bira du-sê xort herin gorekê ji Kizîro re bikolin, ji bo em zû di erdê kin. Pêxember weha tembe li me kiriye. Lê jina wî got: Ez naxwazim vê şevê Kizîroyê xwe binax bikim. Ez ê îşev têr li ser bigirîm, û bira kesek here gundê hanê(nîşane başûr kir) xeberê bi Reşoyê min de, ji bo were çavê dawiyê li bavê xwe xe.

Herweha roja din, li taştîyan xortan gora Kizîro kolan. Reşo kurê Kizîro hat, kefen û Seydayek bi xwe re anî, ji bo Kizîro bişo û kefen bike, telqînê li ser bixwîne. Lê berî ku Kizîro bibin ser textê şuştinê, wî serê xwe rakir. Çavê xwe misda, û bankir: Lê Îslimê..Îslimê.. tasek av ji min re bîne, û di ber xwe de got: Va çiqas devê min

miçiqiye?. Qîrînê bi jinan ket, ên dervayî xaniyê ku Kizîro tê de ramediyî bû, bi hev re ji hev pirsîn: Law çi bû? Van jinan dîsa xêre?

Bersiv zelal hat ku Kizîro ji mirinê rabû. Şênîyê gund di nav hev de şaş bûn, li hevdu nihêrîn, çavên wan vekirî sekinîn, ziman di devê wan de hişk bû.

Ev nûçeya li gund gîş belav bû, weke agirê bi pûş keve, bi lez gihîştê gundên hawirdorê. Û hefteyekê xelk pêl pêl ji gundan dihatin cem Kizîro. Mejiyê Seydan xebitî, wan rewşa Kizîro ji milet re şirove dikir. Digotin ku yek caran Ezrahîl bi şaşîti mirovan dibe wê cihanê, lê dîsa vedigere. Kizîro jî gotinên Seyda erê dikir. Kizîro

digot: Gava ez birim cem dadwerê mezin, wî kitûg vekir û nav xwendin, lê navê min di nav navên miriyan de nedî. Bi rûyekî tirş ji Ezrahîl re got: Te ev mirova bi çewtî haniye, omrê wî hîn xelas nebûye. Vegerîna cihana siftehîn, bira salên jiyana xwe tamam bike. Civatê li Seydan û Kizîro guhdar dikir, ji xwe re xwe re digotin: Subhanallah, û çî navên Xwedê yên azber kiribûn digotin.

Tevşo hevalê Kizîro yê tewrî nêzik bû. Gava Kizîro mir û ji mirinê rabû ew ne li gund bû. Piştî neh-deh rojan vejeriya gund. Lê gava mesela Kizîro bihîst, di cîda, hat cem jê re got: Xwedê te bi jiyana te şa bike, şalam omrê te pir dirêj be.

Wexta dor wan îsiz bû, û Tevşo û Kizîro bi tenê xwe man, Tevşo jê pirsî: Kizîro te çî li wê cihanê dî? Kizîro got: Tu zanî ku ez ne

wiqas mirovekî dîndar bûm. Min nimêj nedikir, rojî jî nedigirt. Û car car gava ez û tu diçûn Kobaniyê, em diçûn Qehwexaneya Karmên, me li wir areqî jî vedixwar. Loma ez seranser ez birim Dojehê(Cihenimê). Bi Xwedê birayê Tevşo yê ku min dî bira kesê benî Adem nebînê. Ezabê ku melaykan li xelkê Dojehê dikir nê bawerkirin. Tevşo jê pirsî: Çi ezab bi wan dikirin? Kizîro got: Ez ê çî ji te re bibêjim, çî nebêjim. Min li meydana gellek Sîtil dîtin, weke Sîtilên ku em savarê (birxul) tê de dikelînin. Ew sîtilana tijî qetran bûn, qetran tê de dikeliya, dikire pilçepilç, li ber her Sîtilekê melaykeyek sekinîbû. Weke min fêm kir mirov tê de dikelyan. Herku kesekî serê xwe ji bin qetranê derdixist, wî melayîkî nigê xwe didan ser serê wî, û careke din ew dikire bin qetranê.

Lê min Sîtileke ecêb dî. Qetrana wê jî weke yên din dikeliya, lê ti malayke li ber tine bû. Yek caran seriyek hema çîşkî xuya dibû, û dîsa bi xwe dikete bin qetranê. Min ji melayekî pirsî, çî mesela vê Sîtilêye? Kesek ji we li ber tine ye, û heta ti serî bi temamî jê dernakevin. Ji min re got: Ev Sîtila ya Kurdan e. Herku yek ji wan dike ku çîşkî serê xwe derxîne ji bo nevesek ba bikişîne, yê li binî Stilê bi nigê wî digirin û wî kaşe binî dikin. Loma ev sîtila ne hewceyê em kesek li ser bisekinin.

LAWÎN ŞÊXO

Palehiya nîskan



Wek ku tê bîr a min, li gund ê me palehiya nîskan berî a ceh û genim dest pê dibû.

Bi rohilat a rojê re pale rêz di bûn di nav xak a xemilandî binîskên kesk û gihayî de, tevî xalên zerahiyê bi giştî, tapan çerx di bûn bi kevirên çerxê û pale li ser rêzeke rast rêz di bûn, û dest bi birîn a nîskan dikirin tevî xwendin a çîrok û stranên paleyan.

Li dûv paleyan melûvan hebûn wan ji meliwên xwe li ser rêzeke rast çê dikirin, di navber a her meliwekê û ya din de ferehiya çar gavan di hiştin, da ku trektûr bikaribê serbest dinav wan re bigerê.

Ev meliwên han li şûn a xwe diman wek komikên biçûk, da ku têlên nîskan hişk bi bin hîn ew di meliwê de, çê nedibû ku van meliwan bikin girîş, wek girîş ên pûş, ji ber livandin a nîskan piştî hişkbûn a wan pir liban diweşîne û cotkar ji vê weşandinê pir xemgîn dibe .

Ahmed Mistefa

roj.ava2011@gmail.com



Gula mim

Gula mim Evîna dilê min

Gul û gulistana min

Kevoka sibeha min

Xewna şeva min

Gula min gula min

Gula min helbestek rengîn e

Dîrokeke parçe ye

gula min welatekî bi sînore

çîrokeke winda ye

Gula min gul a min

Gula min evîndar e

Kevokeke pir delal e

Şêrîn e wek kurdistanê

Gulê û gulistanê

Gula min gula min

Gula min guleka sor e

Navê wê kesk e sor e gula min xewneke şêrîn e

Ferhengeke nû ye gul a min gul a min Gula min keçeka ciwan e Efrîn û Qamişlo û Koban e, buhiştê erd û asman e Gulistan e gulistan e gulistan e. Navê wê Kurdistan e Kurdistan e gula min gul a min helbest e

M. Nûr Huseynî

Bera ez dereng bêm



Bera ez dereng bêm
 Lê ez ê bêm
 Ji şevan dirim
 mûmeke dawerivandî
 steyrikeke rijyayî
 findeke lertzok
 di paxîla şevên biyaniyê de
 rondikên xwe dadiwerivînim...
 ew şevên dûr û dirêj
 roniya xwe ji bîrkirine
 li ser wan peravên tarî û bê keştî
 şevên deryaya wan perçe perçe bûye
 ji hêrsa desthiladariya pêlan
 di van şevên di hevûdu de werdibin
 ji bilî çend dîmenên demê wan daye ber meqesai
 çend bîranînen baskokirî ez tiştê nabînim
 dema baran xurttir dibû
 û ez li ser pira amûdê
 weke yekî dîn
 ta tu bibûrî,
 ta pira amûdê bi şad û şahî bilerize,
 ta dilê min bi nerînên te bikeve semayê
 aniha tiliyên xwe
 li ser pencereya te ya girtî dipelînim...
 ya ji demsalkê de bê ronî ye
 van dîmenan di çarçeweya jiyana xwe de
 didim vî alî, wî alî
 çawa ez ê xwe ji bin bandora wan bidim rexekî di
 çawa ez ê
 ji daristnên bîranînan derbêm??!!
 yên ko li ser darên wan
 pelgan
 toz girtine..
 ez ê tiliyan bipelînim;
 tozê dawêşînim
 li şax û bax û mêrgan
 li wir
 ez û te
 pêrgî hev hatin
 li ser pira kernevalan
 pira evîndaran
 Pira birînên bê xwedî
 zêrevanê te bûm
 ji nerînên tolazan
 min tu diparast!

ew ewrên giran
 û Pinpinîkên berbangê
 min ji ser milên te didan alî
 ew perwanên xatirxwestinê ne
 xatûn!!
 wan bide rexekî din
 ta ez karibim
 ji nû ve bêm...
 ta ko ez karibim bêm
 pêwîst e
 gelek caran
 ez bi dûrkevîm
 ta ko ez bêm
 divê ez bi bêsînorîya asoyan de biçim
 divê bîranîn bidin pey min
 û tu li min temaşe bikî
 ta ko ez bibim rewrewka bejin şikestî
 ta ko ez bibim şengebîyeke
 li ber pencên vê roka dijwar zuhabûyî
 divê li hêvîya min
 bi dûmahîyeke dirêj tu rawestî
 çimkî tu zanî ez ê li dawiyê bêm
 ez ê li gelek balefirgehyan biwestim
 dîmenên te li gelek razangehan
 xewê ji ser çavên min bidin alî
 lê tu zanî
 ez ê bêm
 lê gelekî hatime guhartin
 por sipî,
 çav girikî û
 enî qermiçî..
 tenha ez û demê li ber hev didin
 yê têkçûyî bê guman
 ne dem e!!
 sibehan ez şevan werdigrim
 ew porê te yê zêrînî
 bi hêrs xwe li perdên dil dide
 û bejin û bala te ya bê hempa
 û dengê "Can karat" yê me herduwan jê hez dikir
 hema tevlihevkirina zimanan di stranên wî de
 weke rengê qamişlokê bû
 dema taxa Mehetê
 taxa stasyona tirênê
 ji min û te re dayikeke rewanî bû
 û di cejnan de girê mozan dibû bav

û newroz dibû xwîşkeke xweşewîst
 û ez di nav hogiran de ser bilind bûm!!
 dîsa belqîs peya bû
 kolan mest kirin
 di kolanên mejîyê min de
 dîsa peya bû
 agirê qedîfekirî di rêçikan de
 vexist
 agirê bexûrkirî
 peyama perestiya xwe li ber min danî
 va me ez bi kirasê xwe yî melesî
 bi yemlikê hevirmêşî
 bi navê xwe yî pîroz
 bi textê xwe yî endekokirî
 hûrik hûrik li min mêzeke
 li çavên min yên bi peyalên meya hunguvînî dagirtî
 de vexwe seyda
 vexwe ji lêvên min yên ji etûna siviktirîn
 hatine afirandin
 ji sirûrdan
 sirûdên silêmanî hatine afirandin
 ji nod û neh navên sipehî
 yên xwedayê mihrevan
 de vexwe ji herdu kaniyên lîlavkirî
 de vexwe ji herdu kaniyên sêvgirtî
 tu yî yê ku ez afirandim
 yê ku bejna min lewento kir tu yî
 yê nav li min kirye
 yê min perest kiriye
 yê min ji bayabana tenhatiyê der aniye
 tu bixwe yî
 dunya li min gerya bû
 daristana demûşgirtî li min dorpêç kiribû
 ew yê ku tu bû mêvan li cem wî
 gelek caran
 ew kirin pakrewan
 tabûteke hesinkirî
 bê terim!
 rewanekî vemirtî lê li kîjan çol û beyaran..?!!
 her sal carekê
 seredana wî peykerî em dikin
 em gulwazekê dispêrinê
 û bişûnde vedgerin
 eger tu nehata
 eger te navê min nedaba ber pêlên helbestên xwe
 eger te ne gotiba tu ya min î
 di van şevên birîndar de
 di wan şevên qeşmûşgirtî de
 di wan pencerên binçavkirî de
 te got tu ya min î

awazên te hatine xwarê
li ser pêxîla min venîştin
bû vinge vinga wan
kulîkên sorgulî
li sînga te rast hatim mêşên hunguvînî
bera ew gulwaz biçilmise
bera ew peyker zingar bigire..
û bera tu bê
bera tu dereng bê
rûbar û mêrg
li benda te ne
zend û bend
kanî
bibe hevrazê bejna min
bibe padîşahê hil û moriyan
bibe buhişteke dojhînî di cerg û mîlakê min de!!
xezalek im bê berî bûm
xezaleke gulgulî bûm
vame diçêrim li nik rûbarên dilê te
yên xuşe xuşa sorxwînî ji wan derdibe
bi pelgên xwe yên şîn
xwe amade dikim
li hember dergehên min raweste
ta ez bifûrim
ta ez perwazên xwe bi ser êşên te de biweşînim
ta ez birînên te mist bidim
ta ez te bispêrim hil û moriyan
ta ez te ji nû ve vejînim
ey padîşahê mişextkar
ey padîşahê min
were
ta ku dereng be jî were
lêê
tu
were!!

d.Rufend Temo

rufendtemo@hotmail.com



dilê westiyayî

dilê westiyayî
çiqas tu nazikî
Di vî dilê westiyayî
Av pêjine
Ji lêvên bi av bijmêre pêlên
Derya
Ru sipî di ortê de aso veçirîne
Da te bibîne
Tu di himbêz a min de
Awazan dinalîne
Xewrevîn bi wênê te
Qêrîn a bûkan
Ew dixemilîne
Sor ava dîmenan dihile
Û dimêje
Û yasemîn pêre bihin vedide
Biskên li hev ketî
Bi xweşî dimeyin
Hêsir dişarin av dimîne
çav li ber lingên avê
Mestin bi evîn e
çiqas tu Şêrînî di vî dilê westiyayî de
Ez im di destê te de
Vedenga navê teme.

Narîn Omer

narinomer76@gmail.com



Pênûsa nû ye

Dil miştî vîne	çav berdidan e
Ew rojname ye	çavbîna jan e
Mehbora wê ye	karîn û şan e
Kombend* bû jêre	sih û sêwan e
Nivîskarên me	peyman hildan e
Zanîn û wêje	çanda kurdan e
Karmendin têkde	dem û çaxan e
Pênûsa Nû ye	mêrg û paldan e
Pîrozbahî ye	dengê hemyan e

Sernivîser

Qado Şêrîn

Rêvebirê Nivîsînê

Arşek Paravî

Desteya birêvebir

Abdilbaqî Huseynî

Ezîz Xemcivîn

Lawîn Şêxo

Pîr Rustem

Silêman Azer

Derhener

Xorşîd Şûzî

Ji bo hinartina berhemên kurdî:
kurdi.penusanu@gmail.com

**F
R
E
E
D
O
M
F
R
E
E
D
O
M**



**A
Z
A
D
Î
A
Z
A
D
Î**